

VELAT

ORGANA PARTİ DEMOKRATİ KURDISTAN-Iraq (KDP)
-LIQE 6 EWROPA-

Hejmar:taybeti

Gulan . 1984

ŞORİŞA 26.GULANÉ

ya nîştîmanî, pêşveru

Imperialist û kevneperistên ku rê ji bo peymana Şah-Seddam li Cezaîr li adara 1975 xweşkir, bi xwazîna herifandina şorîşa eylûla nîştîmanî bi rêberîya PDK û Serûkê nemir Barzanî, dida ber çavêن xwe, ku mezintirîn tevgera azadîxwaza rojhelata navîn, wêran bikin. Ji bo vê yekê, organêwan û yên rejêmê bi wave girêdayî, bi taybeti rejêma Şah û Seddam di herêmêde hêrişeka propagendeyî û siyasi ya berfireh û pir bi jîrî, birin ser qiyadeya Barzanî, ji ber ku wan baş dizanî, ku ev serkirdayetîye, bi şâsiyêن xwevejî, serkirdayetiye ka nîştîmanî welatparêze û meslehetên milletê Kurd yên bingehî dipaarazt û qet bazarî li ser mafêن wî nedikir. Serkirdayetîye Barzanî cihê bawerî û rîzgirtina berfirehtirîn bingeha xelkê Kurdistanê bû.

Li 26ê Gulanê 1976, ji serê ciyayan bersiva xelkê Kurdistanê hat. Komikên biçuk yên jîr, agirê bergirîyê û meşxela şorîşê bilindîkir, tem û tarîya rejêmê faşist û kevneperist, li ser Kurdistanâ birîndar, hilandin. Şorîşa Gulanê ronahi havête ser wê rastîyê, ku mesela kurdi hêsta li çarenûsa xwe dipirsîtin. Peymana Cezaîr bo bi sebeba pitiralozkirina vê meselê, lewa bersiva li ser wê pir bi lez û bi hêzbû, ji ber ku milletê Kurd ji këmtirîn mafêن xwe dûre.

Bergirî di Kurdistanâ Iraqê de her berdewame, bi her reng û yek jê bi rengê çekdarî. Şorîşa 26ê Gulan berdewambûna şorîşa eylûla pîroza nîştîmanî ye, bi terzek baştir û bi naverûkeka civakîya kûrtir. Şorîşa Gulanê her di destpêka xwe, ne tenê barê qewmî(neteweyî) girt, lê belki giringîyeka mezin da ser barê civakî ya tevgera ...

Rûpelê 4

Mekteba Siyasi ya (P D K) Iraq, roja 21.5.1984 ev ragehandin belav kir:

Di bajarê Kurdistanê de, bi taybeti Suleymanî, Dihuk û Hewlêr, rîveçun û demonstrasyonên mezin û bi deng çêbûn dijî bîzorîhajotina xwendî - karan bo "leşkerê millî" yê Seddam û dijî cenga wî.

Mezintirîn û firehtirîn demostrasyon roja 13.5.84 di bajarê Suleymanîde çêbû. Peyayê emna Iraqê agirbaran-kir û 7 xwendîkar bi gulleyên wan şehîdbûn û 35 birîndarbûn. Li pey wê roja 13.5 xelkê Suleymaniyê dikkan û kargehî xwe girtin û ketin sed cadan hejmara wan giha 50 hezar kes û hêriş birin ser merkezaka hukumetê, pir çek jê birin, şewitand û 5 polîsê rejêmê kuştin. Roja 14.5 dîsan demonstrasyon çêbûn, bi xurtir û bi hêztir û 10 otombêlîn rejêmê hatin şewitandin. Ta iro rewş bi vî rengî dumdike.

Kurdistan, 21.5.1984

M.S. (PDK)

raperîna Xwendikaran

"Xwendîkar û xurt serê tîrêne
di Şorîşan de"
(Serukê nemir Barzanî)

Mamon Debağ, Abdulkaliq, Spîndarî, M.S. Pencîwinî, Leyla Qasim, Kûrdîstan Salih, Gazî, Rêber, û Berbeyar, Tariq û bi sedan Şehîd ji Xwendîkar û Xurtên Kurdistan bilintirîn Sîmbola xebatê û qaremanî nîşankir.

... rûpel 3

LESKERÊ ŞORİŞGERÊ KURDISTAN

Karûbarê çekdarî û siyasi:

- 78 karê şoresgerî dijî rejêmê.
- 7 karên hevrayî bi hêzên Cud re
- 2 husta, yek firensî û yek itali hatin girtin.
- 3 merkezê dixtorî yên rejêmê hatin dagirkirin.

Ev karên şoresgerî, bi taybetî di Zaxo, Akrê, Şexan, Mêrgesor, Gewêr, Seyd-Sadiq, Selahedîn, Şaneder, Xormal û Helepçe de çêbûn.

Ji 1.1.84 ta 29.2.1984, 78 karê çekdarî hatin kirin, 244 ji dujmin hatin kuştin, 122 birîndarkirin, 21 otombêl hatin şewitandin û 3 tankû rejêmê wêrankirin.

Bi hêzên cebha Cud re 7 karûbar kirin 25 karê şoresgerî di hundirê bajarê Suleymani, Mosul û Dihok û bajarê dî çêbûn.

Pir derman û destgahê pizîşkî ketin destê Pêşmergan li Diyana û Şêxan. 9 Klaşînkov, topeka 60mm û 1 RPG û gulle û fişek.

6 exsîr, jê yek swîsrî û 1 itali. Xisareta me, 12 şehîd û 13 birîndar ji Pêşmerge û endamên PDK, 1 gündî şehîd bû, jinek û 4 zaruk û 4 kes birîndarbûn.

Bijli vê hêsta, rêkxistinê hundirî û Pêşmergên qehreman 207 karûbarê siyasi û cemawerî çêkirin, ji belav kirina belavûkên PDK ta girtina civîn û kombûnên siyasi.

Silav û rêzgirtin ji Pêşmerganre.

Bijî Şorişa 26ê Gulânê.

Bijî PDK . Bijî eniya Cud .

Cud

Eniya niştîmanî demokratî iraqî(Cud)

Civata bilind ya (Cud) di 6. ta 9.2. 1984 civîna xwe çêkir. Girogiriftêni siyasi yên Iraqê, rewşa cenga iraqî - iranî û lîstika xiyaneta komika Celal Talebanî, di civinêde cihê xwe girtin. Çend bîryarêne giring li ser rewşa siyasi, leskerî û propagendeyî hatin derbazkirin ji bo herifandina rejêma diktaturî û damezrandina hukmeta demokratî û misugerkirina autonomiya dirist bo Kurdistana Iraqê. Avakirina Eniya fireh bi pêwistîyeka pir giring (Cud) dibîne. Civînê belavûkeka siyasi li ser rewşa Iraqê, herêmê û cihanê derxist.

PARTÎ DEMOKRATÎ KURD -Surye-

Di kongira xwede ya çaran, P.D.Kurd li Surye, rîbaza xwe ya niştîmanî pêşveru nişankir û rîzên xwe yên rêkxistinî û bîrobawerî peytkir, da ku xebata xwe di vê rewşa nazikde pêşdabibe ji bo bicihanîna mafêneteweyî yên gelê Kurd.

Kongira Partî di bîryarêne xwe yên siyaside, rewşa Kurdistana Iraqê bi giringî da ber çavan û da nasîn, ku rewşa Kurdistana Iraqê, rewseka pir nazik û taybetiye bi nisbet milletê Kurd û tevgera wî ya azadî-xwaz bi giştî. Kongirê Şorişa 26ê Gulânê li jêr alayê PDK-Iraq pîroz-kir, şorişa ku roj bi roj firehtirdibe û li hemî herêm û warêne kurdistana Iraqê cihê xwe vedigre û xwe kir bingeh û palpişti ji hêzên pêşverure yên xebatê dîkin ji bo hukmê demokratî ji Iraqre û ji bo autonomiya dirist ji Kurdistanre. Kongire bi tundi karê xiyaneta "YNK yeketî niştîmanî Kurdistan" îdane kir û her wejî hêrişa leşkerê Turki. Kongire piştgîriya Cud û hêzên wê dike.

Bijî Partî Demokratî Kurd li Surye.

Silav û rêzgirtin û piştgîri ji xebata wê ya pîroz re.

HÊRIŞA TURKİ LI SER KURDISTANA IRAQ
... CEWA HAT ŞIKANDIN .

Li jêr vî nişanî, besê ragehandina PDK, pirtûkek derxist, têde bi direjî hêrişa Turkiye tê baskirin. Çewa hêriş çêbû, çima çêbû û çewa hat şikandin ?

Pirtûk dokumenteka giringe li ser rawestanêni niştîmanî yên PDK beramber vê hêrişê û bîryarêne şoresgerî yên qiyadeya PDK ji bo şikandina hêrişê dide ber çavan. Rewşa hêrişê roj biroj tê analizekiran û mîrîni û xwe gorîkirina pêşmergên qehreman tê baskirin.

biji PDK
biji Cud


Raperîna Xwendikaran.... ji rûpelê i Xwendikar û Kurt cihê xwe yê taybeti di şorişen milletande heye, herdem li pêşîya xebata azadîxwaza demokratî diçin, dîbin çirîska agirê şerê şerefê dijî kevneperistî, imperyalismê û paşvemanê. Her wejî xwendikarên Kurdistan, îro bi destek qelem û bi destek ala xebatê bilind dîkin.

Xwendikar û xurt bi kiryarî û bi dil û can besdarbûn di şorişa Eylûlêde û di şorişa 26ê Gulanêde. Bi sedan şehîd pêşkes kîrin û rastîya gotina Seruk Barzanî bi cih anîn.

Îro jî di bajarên Kurdistanêde dîsan her xwendikar û xurtin dikevin pêşya demonstrasyona û şehîd û birîndar dîbin.

Raperîna xurt û xwendikarên Kurdistan textê Saddam hijand û "kunêni mişkan ji Celal Talebanire kîrin qeyserî". Bi vê raperîna xwe, xurt û xwendikarên Kurdistan, navê yeketîya xwe dîsan bi xwîna şehîdan nivîsand. Çend pîroz û bi hîmete yeketîya we ho xwendikar û xurtên qehreman "yeketîya xwendikarên Kurdistan" û "yeketîya xurtêن (lawanî) Kurdistan". Îsal ku 31 sal li ser damezrandina wan derbaz dîbin, em gerimtirîn silavêن şoreşgerî pêşkesî vê bîrewerîyê dikin û bi dil û canê xwe pişgîriya xebat û raperîna birayêن xwe xwendikar û xurtên delal dikin, ew raperîne pişkeke ji şorişa Gulanê û xebata Pêşmergêن qehreman.

Partîya me serwere
Pêşmerge çavê sere
ji çiya hate xware
jehrê dide neyare
hey Pêşmerge bayê min
lêxin herdu çavên min



ÎZGA DENGÊ KURDISTANA İraq ê

Dengê Kurdistanâ İraqê programê xwe, bi zimanê kurdi û bi zimanê erebi belav dike.
dema êvarî seet 15⁰⁰ ta 16⁰⁰
dema subê seet 7⁰⁰ ta 8⁰⁰
li ser . pela kurt , 49m dirêj

.....

SIVAN PERWER , stranbêjû hozanê pir bi nav û deng, bi dengê xwe çend gotin û 2 stranêن şoreşgerî bi rîka îzga dengê Kurdistanê pêşkes bi pêşmergêن qehreman kîrin. Îzgê bi xweşî roja 12.5. belavkir û nameka supasî û rîzgirtinê ji ŞIVAN re rîkir.

LİSTIKA NÜ YA RUVİYEN XAPINUK.

CELAL TALEBANI...TIM CAŞATI

Vegera komika Celal Talebanî bo hundirê rîzêne rejêma faşist, lîstik û kompiloteka nû ye, pir bi qirêje, dijî mafêni milletê Kurd.

Rejêma diktatori û caşen wê yênen her demî propagandê jêre dîkin, lê millet baş wan dinase.. PDK her di zude komika İbrahim-Celal tazî kir û da nasîn, wek komikeka kevneperist oportunist direwin karê wê bazarîye li ser mafêni milletê Kurdistanê. Komikeka girêdayî bi hêzên kevne-perist û imperyalîve.

Vê komikê bi arîkariya Şahê İranê di sala 1964 de, dixwaztin PDK parçê bikin, lê kir û nekir ev kare wan pê çênebû, rîka xiyanetê û caşatiyê kir bi armance xwe, çekê xiyanetê girt bi destê xwe û li pêşîya leşkerê İraqê diçün û hêriş dibirin ser bingehêni şorişa Eylûla niştîmani. Hezaran Pêşmerge û xelkê Kurdistanê bi gulleyen wan şehîdbûn û bûn bi sebeba paşsistina şorişê demeka dirêj. Xelkê Kurdistanê ew bi caşen 66 ê bi navkîrin. Rewsa wan ya gemarîta peymana 11.adara 1970 dumkir, wêca bi pêy mercen peymanê, rejêma beisi ew havêtin.

Li pas peymana Cezaîr 1975 ya imperyalî kevneperist, valatîyeka siyasi di Kurdistanêde çêbû. Komika Celal dîsan serê xwe hilda û hatin meydana siyasi bi navekê xapînuk "yeketi niştîmani Kurdistan (YNK) bi armance pirkirina wê valatîyê. xwe kîrin pêşveru, şoreşgerî û bi mafêni milletê Kurd bangdikirin û sloganâ şorişa iraqî bilindkirin, lê dewrê ji wanre nişankîri, nehatin guhartîn. Wek rûviyên xapînuk lîzti û komlot digerandin, da ku rîza niştîmani wêran bikin, Cud perce bikin û Şorişa 26ê Gulanê bişkînin.

Peymana xwînrêjê İraqê Saddam û Celal perde li ser rastîya rîberen (YNK) û tiyatroya wan hiland. Celal vegerîya cihê xwe yê tebîf. Rîzêne tevgera niştîmani ji qirêja wî hat pakkirin.

KDP dîsan sozê dide xelkê Kurdistan û İraqê, ku xebata xwe xurtir dike, karûbarêni xwe di nav (Cud)de û bi gişt komelén dij rejêma Saddam, zêdetir dike, ji bo têkdana lîzti ka xiyanetê û herifandina rejêma faşı.

Paşmaye: ŞORİŞA 26 ê GULANÊ ji perê 1 ..

azadîxwaza kurdi.' Partiya me dest pi karê xwe yê siyasi û çekdari kir piştî ku şikesta 1975 da ber çavêن xwe, anelîzekir û ders û tecrîbe jê birin, li pêşîya her tiştekî xwe girêdan bi stratecîkeka pêşveru û çûn li ser rîbaza nû ya ku konfirensa 1976ê iqrar kir û kongira nehan li sala 1979ê derbazkir.

Şorişa 26ê Gulanê ne tenê çêbûneka mêmüyîye di tevgera azadîxwaza kurdîde, lê belki tevgera niştimanî ya Iraqêjî livand. Şorişê destpêkir bi bilind-kirina sloganâ herifandina rejêma beisî efleqî, wek daxwazaka mêmüyî û ji sala 1976ê û pêde, roj bi roj, xwazîna "Autonomî bo Kurdistan, Demokrati bo Iraq", rastîya xwe, piştî pir buyera, bi cih anî. Sal derbaznebûn û hêzên bingehî yên tevgera niştimanî Iraqîjî, ev sloganên ha kirin yên xwe, irojî gelê Iraqê, bi Ereb û Kurd û komgelên biçük li dûra wan dicivin.

Xwe girêdan bi vê rîbaza pêşveruve, xwe gûrîkirin û mérîni ya xebatker û Pêşmergên qehreman, PDK gîhand cihê xwe yê bilind û serekî di Kurdistanê Iraqêde û di herêmêde. Di sala 1980 de, PDK karî bi çend hêzên niştimanire, enîya demokrati niştimanî damezrînin û ta iro xwe li meydanê radigre. PDK di vê barêda pitir xwe mandû dike û tim dixwaze, ku bi rîka gelek enîyen niştimanî, bigehe çêkirina enîya niştimanî ya berfireh.

Iro Partiya me peywendi yêndustani û hevalbendî û solidarîyê bi firehtirîn komel û hêzên azadîxwazên herêmê û yêndî cihanêre hene. Partiya me xwe girt li ser sloganâ "biratiya Kurd û Ereb" û "yekgirtina niştimanî Iraqî", wek baştırîn rî ji bo rizgarkirina Welat û bi vê rîkêde, peywendiyê PDK, xwestir çêbûn bi komel û hêzên tevgera azadîxwaza niştimanî ya Erebire.

Xwe girtin li ser bawerîya "yekarmanca gelên herêmê", we kir ku PDK her di destpêkêde cenga Saddam dijî Iranê fidane bike. Me ev ceng bi cengeka sitemî zalim naskir, agirê wê Saddam li catî împeryalîsma emriki û kevneperistiya erebî helkir.

Şorişa 26ê Gulanê, ya niştimanî ya pêşveru, xwe di salêن heştêyênde, bi Şoriseka gelî ya berfireh da nasîn. Pêwîste em iro berê xwe bidîn piştê, da bibînîn ku çewa vê Şorişê bi palpiştîya xweyî(zatî), ya ji millet dibir, ew milletê bawerî pê anî, da ber sîngê xwe, bi xwîn û xuha xwe avda û bi çekê xwe ragirt. Ev pir zanîn û fîrbûn ji destpêkirina Şorişa Gulanê, bîr û bawerî ya xebatkeran bi wê zêdekir, ku mirov xwe pitir bidet pala milletê xwe, yê ku amadeye bi merdî xwe gûrî biket ji bo mafêن xwe yêndî demokrati û millî.

Xelkê Kurdistanê, xasma li buhara 1982 û pêde, bi raperîn û demonstrasiyê rîveçûnê gelî dijî rejêma Saddam, dijî cenga wî ya sitemî zalim û dijî fermanen wî yêndî şofînî, diyarkir, ku çend berze huşyarbûna wî û şiyana wî ji bo gûrî kirinê û danê.

Pêwîste û fere li ser me, em bidîn ber çavên xwe, ku mercen serfirazbûnê : yek, palaxwedan li ser kanîn û şiyana milletê xwe, bi taybetî li ser kedkaran.

duwem, peymangirtin û xwegirêdan bi hêzên pêşverure, di hundur û derveywelat.

Bîrhatina nû ya Şorişa Gulanê di demekêde hat, ku piraniya xelkê Kurdistanê, xasma xwendikar, xebateka mérânî dijî cenga Saddam û bizorî hajotina wan bo cengê. Kar û bizava Pêşmergên qehreman pitir û xurtir dibe, dijî organ û desgahêñ rejîmê. KDP û hêzên (Cud), cihê xwe di nav dilê milletde bi firehî heye, emman cihê komikên wek "yeketî niştimanî Kurdistan (YNK)", yêndî xwefiroş, xasma piştî ku lîstika wan ya bi qirêj û genî di hundir hêza bergirî tazi û aşkire bû, û bi aşkire xwe havêtin vêza rejêma Saddam, cihê caşatî û xiyanevê ye. Peymana Saddam-Celal, pilanek împeryalî kevneperistiye ji bo çareserkirina mesela kurdi. Lî her kes dizane ku çareserkirina mesela kurdi get li jêr sébera teror û kevneperistîyê çenabê, çareserkirin bi aşti û demokrati dibe, bi aşti û adilane dawîdan bi cenga Iraq û Iranê û bi damezrandina hukumeteka demokrati hevrayî ji bo Iraqê û autonomî ya dirist ji bo Kurdistanê.

- Bi jî Şorişa Gulanê ya pîroz bi serektîya PDK û Serûkê wê heval Mesûd Barzanî.
- Silav ji bo Pêşmergên qehreman .
- Silav ji bo Xelkê xwegirtiyê Kurdistanê.
- Serkeftin ji bo hevxebata gelê Iraqê bi Ereb, Kurd û komgelên biçük ji bûna Aşti, demokrati û pêşkeftina civakî.